

MUSTAFA TANGUNER

Mêrxasekî Dilpak

Amadekar

Faris Medeni Marsil

Institut kurde de Paris

**Ev kitêb, ji nivîsên hevalên Mustafa Tanguner yê bi
minasebeta 20 salîya salvegera şahdetê wî angoyê sala 2005ê
de hatine nivîsandin û piranî di kurinfo.com de çap bûne de,
pêk dihê.**

Xxx

**Bu kitab, Mustafa Tangüner'in arkadaşları tarafından onun
şahdetinin 20 yılında yani 2005 de yazılmış ve çoğu
kurinfo.com sitesinde yayınlanmış yazılardan oluşuyor**

Nuha axa biyaniyê te vedişêre
Nuha gullên di canê te de nefretê vedirêşe
Nuha kena te maka hêviyê ye
Û emê te têxin arşîva dîrokê

Ahmed Huseynî

Institut kurde de Paris

Mustafa Tangüner/Mêrxaseki Dilpak

Amadekar: Faris Medeni Marsil

Birinci Baskı İstanbul- Nisan 2017
nasAjans yayınları

Kapak: Kevin Marsil

Baskı

Özdemir Matbaacılık-Sabri Özdemir
Davutpaşa Caddesi Güven Sanayi Sitesi, C Blok No: 242
Topkapı-Zeytinburnu / İstanbul

Sertifika No: 18613

ISBN: 978-9944-221-20-7

Tüm hakları saklıdır

nasAjans ve FMMarsil'in izni olmadan çoğaltılamaz

nasAjans Yayınları

Alemdar Mah. Divanyolu Cad. Erçevik İşhanı, Kat: 2

D: 212-213 Cağaloğlu- Fatih/İstanbul

Tel&Faks: 0212 576 82 21

[naisaians@gmail.com](mailto:nasaians@gmail.com)

Sertifika No: 22098

Institut kurde de Paris

Mustafa Tanguner

Mêrxasekî Dilpak



Amadakar: Faris Medeni Marsil

NAS

Institut kurde de Paris



Mustafa Tanguner

(1.01.1959 - 4.11.1985)

Mustafa Tanguner (Tesvir, Naîm) di 1.01.1959ê de li gundê Kurdhecî yê Bismilê hat dinê. Ji malbetekî feqîr bû. Xwendina xwe ya serete û navîn li Dibistana Leyfî ya Farqînê kir. Li Diyarbekirê li Lîseyaya Senat xwend. Di vê demê de li Diyarbekirê û Bismilê di nav refên DDKDê de dest bi xebata rêxistinî kir. Uniwersîteya Bogaziçi ya Stenbolê qezenc kir lê li ber sedemên aborî dewam nekir. Di 1978/79ê de li Ensituya Perwerde ya Diyarbekirê qeyda xwe çêkir. Di Enstutiye de bêşdarî xebata xwendekaran ya akademîk bû û di têkoşîna neteweyî û civakî de ciyê xwe girt û di nav xwendekaran de hat naskirin û bû birevebirê DYOKD (Komeleya Kulturî ya Xwendekarên Bilind a Diyarbekirê). Di heman salê de bû endamê KIP (Partiya Karkirê

Kurdistanê). Piştî ku di Nîsana 1979ê de li Kurdistanê û Tirkîyeyê Orfî Îdare hat îlankirin û xebata legal a DDKDê hat sekinandin ew li ser dîrektîfa partiyê bi ilegal xebat xwe dom kir; di komîteyan de cî girt.

Piştî Cuntaya 12ê Îlona 1980ê di şertên giran de xebata xwe domand; gelek caran hat girtin, hat şkençekirin lê dev ji micadeleya xwe berneda. Di 20.01.1981ê de çû Libnanê li kampên Filistinîyan de perwerdeya leşkerî dît. Li wê jî di nav hevalên xwe de teqdîr dît. Gelek caran ji mirinê xelas bû. Rêxistina wî di dawîya cotmeha 1981ê de Mustafa şand Bûlgarîstanê ji bo xwendina bilind. Li Sofyayê di Fakulteya Felsefeyê de du sal xwend lê ser biryara partiyê dev ji xwendina xwe berda û di 24.03.1984ê de çû Danîmarkayê.

Li Danîmarkayê xebata xwe ya sîyasî û demokratîk domand; di nav Komeleya Demokratên Kurdistanê de xebat kir û rêveberîya wê kir. Li Danîmarkayê jî di nav heval û dostên xwe de wek têkoşer hat naskirin. Ji alîkî ve endamekî girêdayê partiya xwe bû ji alî din ve jî dijîminiya tu rêxistinê din nedikir. Bawerîya wî bi avakirina 'Otorîteyeka Neteweyî' hebû; berjewendîyên neteweyî pêşîya her tiştî bû.

Di 4ê Mijdara 1985ê de saet 17.15ê de li paytaxta Danîmarkayê li Kopenhagê bi dîrektîfa birêvebirên PKKê bi komployekê hat kuştin.

Mezelê wî li Goristana Çoban Çeşme ya Yeni Bosna/ Stenbolê ye.

Yaşar Abdulselamoglu
Camêr û "cuzzam"



Ev bû 20 sal in ku hevalê min Mustafa
Tanguner hatiye kuştin.

Camêrê kurdperweriyê di 4. 11. 1985a de li
Kopenhagê hate kuştin.

Mistefa ji DDKDyê bû.

Ew ji aliyê PKKê, bi biryara PKKyê hate kuştin.

Roja kuştina Mistefa, ji bo min roja le'netkirina tîpa xulamî, a
kiroyî ya ku heyranê 'efendiyê' xwe ye, ye; di vê rojê de li
hember tîpa kirêt a kuşdarên kurdan, divê nirx û heysiyetên
camêrtîya kurd bilind bibin.

Seîd Aydogmûşê hêja got ku; ji bo kujdarê Mistafê dibêjin,
"Cuzzam". Ew nexweşî wek îlleta mîskîniyê tê naskirin. Mîskîn,
ji ber ku nexwaşîya cûzzamê girtine, di eslê xwe de, pir bêçare
ne, ji destê wan tiştek nayê. Lê mîskînen me yên nû yên kurdan
ne wer in; ji destê wan kuştina camêran tê; kuştina kesên yên
ku ne wek wan in -hişazad in, delal û bi evîndarîya kurdan dildar
in. Mirov dibîne ku di kîn û xirabîyê li ser kurdan de kes mîna
wan jêhatî nîn in, bi derbekî re bê tu endîşeyan dikarin kurd
bikûjin. Hewldanên wan ew e ku her kesê hişazad, delal û çê
bikin mîna xwe, welatê camêr û azadîperestan bikin
mîskînxaneyê cûzzaman.

Taybetîyên mîskînan taybetîyên mirovê kolê ne; ew ji yên xwe hez nakin. Ji xwe sedema kolebûna kolê ya esasî ev e; ew ji wan nefret dike, ji wî ra bi çavên koledar ên efendiyê xwe dinêre; loma ew dikare bi hêsanî kurdan bikûje. Tesawira kurdkujdarê li ser kurdan tesawira tirkan e. Di serê wî de tesawir û diskûrseke dewlemend û fire ya nasnameya kurd tuneye. Loma jî ew nikare ji kurdan hez bike. Ji wan nefret dike, ji ber ku, ew ji xwe zane ku di xwe de tiştê bo hezkirinê tuneye, ew mîskîn e û tev kurdbûnê ji mîna cûzzamîya xwe dizane.

Tev kujdarên kurdan xwedî nexweşîya "cûzzamê" ne.

Di wan de hesta tutiştûnê heye. Lê ew bi vê îllûzyonê ra ne ku; bi tenê gava ew bi hêzeke total, temamiya civatê, welat û jîyanê bixin bin kontrola xwe, wan bikin nexweşxaneyeke giştî, ji bo 'tedavîkirinê'; ew dikarin bibin tiştêk.

Cûzzam û camêrê Kurd – Mistefa nişan û temsîlkarên du felsefe û exleqên jîyanê bo kurdan yên ji hev cihê ne; yekê ya nefretkirin û kîndariyê, ya din a hezkirin û evîna kurdîtiyê. Yekê ji wan bi felçkirina eqil û hestê, bi tirsandinê dibe serdest, a din, dixwaze bi riya bilindkirina rolên hişmendî û dildariyê ji kurdîtiyê ra nasname û fazîletên nû bidê, gîyaneke berz a kurdbûyînê derxe pêş. A yekê mentalîteya xirapkeriyê ye; lê ya din giyana pak a çêker û avaker a ku li pêydakirina pîvanên jîyanê ya optîmal digere; dixwaze jîyanê bive li kiraxa xilasker a avadanîyê, şaristanî û gîyanberzîyê.

Kîjan ji wan bihêztir e; ew a bi hez û evînê yan a ji bo zor û xirabkerîyê?

Ta niha di nav kurdan de ya ku serdiket, ew felsefe bû ku bê zerreyeke endîşa kurdan dikuşt; ew bi kujtina kurdan bawerdikirin ku xizmeta kurdan dikin; bi tirsandina wan, bi zora sîlehê felçkirina eqil û dilê wan. Wer ew bi tirsandin û kujtina di nav kurdan de desthilatdariya xwe peyda dikirin.

Mistefa û yên mîna Mistefa nedikaribûn kurdan bikujin; di evîn û felsefeya wan de ew xizmetkarên kurda bûn, bi evîneke bêsînor xwe dabûn ji bo jîyanê ew ji bo wan xweştir, qençtir û bi rûmettir bikin.

Hin kes sosyolojîya mirovê kurd ji me ra rawe dikin, dibêjin; kurd ji zorê fam dikin, heta li hember wan zor bikarneyîni tu nikarî di nav wan de xwedî hurmet û hêz bibî. Ew bi tenê bi tirsê û bi zorê dikare ji te ra bibe 'yar'. Yê ku kurdan dikujtin, "serketin", her rêxistinên kurd ên ku heta niha xwe bi 'xurtî' parastina, ew di saya kujtina kurdan de wê bidestxistine. Lê baş binêrin, weka ku grafîka xurtbûn, bi hejmara kujtina kurdan ji aliyê wan ve paralel çûye. Wer e yan na, divê vê mineqeşe bikin, lê ez zanim, ew nerîneke mirovevînîyê nîne û; ew têgihîn û dîskursa ne normal a koledarên kurdan e. Ne li ser hez û evîna kurd, li ser dijmintî û kîndariya kurd binyat bûye.

Mistefa û hevalên wî ji kujtina kurdan bi destê kurdan dilbêzar dibûn, ew dilzîz bûn. Ew bi vê ramanê re bûn ku vejîna kurd bi evîndarîya kurd dibe, ne bi dijminatîya wî, bi kujtina wî.

Mistefa û hevalên wî nikarîbûn kurd bikûjin, loma "wek rêxistin windabûn". Fikra kujtina kurdan ji Mistefa û yên wek wî ra wek fikra felaketê dihat; bi tenê ew zanin, wê felaketê çawa bi xeletîya kurdên gîyanpak da jîyane. Ew wê felaketê ji her kesê bêtir hê ji dema kujtinên Dr. Şivanî û Seîd Elçiyê de jîyan e. Dibe ku hinek ji di saya wê kovan û keserê de, xwîna kurd a paqij ji bo wan hê bêtir pîroz û bihatir bûye. Ew zû gihaştin wê bawerîyê ku di dawîya dawî de kujtina kurd tu feyde nade te; ew hewldana neteweyîyê bê me'ne dike. Belê, yek ji sedemên herî bingehîn ku "Rêxistina sîyasî ya herî xurt" a Mistefayî 'têkçû', ev e.

Kurd heta ku kultura kirêt a kujtina kurd le'net neke, ew ne layiqê azadîya xwe ye!

Bi tenê, kurdên ku bi hiş û wijdaneke azadane dijîn, dikarin jiyaneke bi rûmet ava kin.

5.11.2005

Şefiq Oncu

Cuzzam



Mistafa Tangunerê ku sembola mêrxasî, fedekarî û dilsozîyê bû, hevalê min ê zaroktîyê bû. Kêm kesan zanibû ku me bi hev re li Farqînê xwendibû, kêm kesan zanibû ku me bi dehan caran bi hev re ji sebiyên Farqînê lêdan xwaribû. Dîsa kêm kesan zani bû ku berîya kal û bavê wî, kalê min Seydayê Abdulhemîd li gundê Hacîya kurmanca melatî kiribû.

Berîya şehadeta wî ez û hin hevalên din em mêvanên wî bûn. Em ji bo karekî rêxistinê çûbûn Danîmarkayê, ew jî mazûbanê me bû. Dem gelek dijwar bû ji alîyekî cuntaya eskerî li hindirê welat zilmeke bêhudûd li şoreşgeran û welatparêzan dikir li alîyekî jî xwarzîyê tirka, „ ê ji me çêtir „ bo di sîyasetê de bi tenê bimîne artêşa xwe ya ji cuzzamîyan-kotîyan pêkhatî bi pê kurdperwerên li gora wî dê bo wî bibin asteng, xistibû. Bi ser de jî kar û barê rêxistina me ne li gora dilê me dimeşîya. Gelo biryara berterefkirina bi dehan kurdperweran tenê a Apo bû, şik jê heye lê êdî di sala 1985an de em bi gelemperî pêhesîyan ku PKKê birayara kuştina ji cuda cuda rêxistinên bakûr ji sedî zêdetir rêvebir, kadro û şervanî sitendibû.

Rêzdar Seîd Aydogmuş ji qatilê Mistefa re dibêje „ **Cuzzam** ” (kotî). Helbet navek wî heye û dîyar e jî. Bêguman gotina

cuzzam cîhê xwe girt û tu peyveka din dê ewqas li van mêrkuja nehata..

Rê û metodên dihatin bikaranîn helbet ne metodên kurdan bûn. Wan berê jî lê di vê demê de bi şeweyeka nedîti metodên bi kirêt bi bêbextîyeka mezin bikar anî. Raydarên PKKê pêşiyê ji welat û herêman ji rêxistin û afgirên xwe, di der heqê rêxistinên din ên Kurdistana bakûr agahdarî xwest. Di raporên ji teref polîsê almanî hatibûn girtin, navên berpîrs û kadroyên rêxistinan bi têbinîya „ **heger evana nebin dê xebatên van rêxistina nemeşe**“ hebû. Xuyabû pîrseka weha ji wan hatibû kirin. Paşê jî dîsa bi metodeka ku ji sedî sed ji ereban fêrbûbûn, hin hevalên xwe weka ku ji wan veqetîya bin, şandin nava rêxistinan. Ev kesên bi fermana serokatîya PKKê hatibûn şandin digotin, ew ji apocîya veqetîyan e, neçar in û hewceyî alîkarîyê ne. Helbet herkes ne weka wan dilreş û xêrnexwaz bû û loma jî gelek wan birin malên xwe. Evan necamêra jî mal, kar û hemû agahîyên bo êrîşan berhev kir.

Mistefa kurdperwerê yekê bû ku ji teref artêşa cuzzamîya û bi erka tesfîyekirina rêxistina wî hate kuştin. Mistefa qatilên xwe nas kiribû. Lê ji dilpakîya wî qe nehatibû bîra wî ku dê kurdek karibe kurdperwerekî weka wî bikuje û bo vê yekê mazûbantî jî jê re kiribû. Qatilên wî bêbext bûn, bi dostanî ber wî de hatibûn Mistefa jî bê fikar derîyê xwe li wan vekiribû.

Bêşik ne hewce ye ku ez bêjim wî serî li ber zalimên cuzzamî dananiye. Ên mêrxasîya wî dizanin ew ê texmîn bikin ku wî

weka şêra di ber xwe dayî ye. Mistefa li xerîbîye ji teref
cuzzamîyekî ku qaşo bi erka „paraztina şoreşê“ hate kuştin.

Termê wî ji mehekê zêdetir li xerîbîyê ma. Paşê bo biçê welatê
xwe bi rê ket. Lê sed mixabin ne gîhaşt Kurdistana li ber dilê wî
ewqas şêrîn bû.

Heger rojek em leqayî hev bibin, ezê nikaribim li çavên te yê
çiq binêrim Mistefa. Qatilê te bi sala ye li nava me digere û tu hê
jî li xerîbîyê yî.

Nizanim gelo ma bi pesindariya em ê karibin heqê te heq bikin ?

6.11.2005

Murad Ciwan

Mêrxasê ku hemî li serê yekdeng in

Gava daxwaza nivîsandina bîranîn û dîtînen xwe yên li ser Mustafa ji min hat kirin, min awirên bîra xwe dan heta nivê dehsala 1970'yan, wan salên ku min ew naskir. Wê demê mala me li Bismilê bû. Her çendî ez berdeyamî ne li wê derê bûm, min demekê li Diyarbekirê, demekê jî li Îstanbulê dewama xwendegehê dikir, dawiya hefteyan, li tahtîlan û bi piranî jî di vehêsanên havînê de ez diçûm Bismilê.

Li Bismilê bi tevlêbûna min û hin mamosteyan û gencan tevgerika gêncên Kurd a şoreşger a germ û bibizav ava bûbû, di nav xelkê de alîgir û hezkirên wê roj bi roj zede dibûn. Komeleyeka kulturî li Bismilê hebû ku qeymeqam, fermandeyên polis û jendermeyan û karmendên dadweriyê yên qezayê ew ava kiribû û mamoste û memûrên din jî endam bûn, piştî demekê bi tevayî ket destê gênc û mamoste û memûrên alîgirên DDKD'ê. Lokalên wê komeleyê cihekî xweş ê bikêrhatî bû ji bo gencan da li wê dere bicivin û çalakiyên xwe bimeşînin. Mustafa Tanguner wê demê bawer dikim diçû xwendegeha navîn. Hê nuh ji zaroktiyê derdiket, gêncekî xama bû. Lê di nav wan de li xwendegehê, li sûkê, li gundan, li her derê dibizivî, wek topeka agir germ û dilsoj bû. Çavên xwe ji tu xeterê nediniqandin, ji tu çalakiyê xwe nedida alî. Di her demê de li pêş bû. Bi qasî vê çalakvaniya xwe ew qas jî dilsoz, birehm, fedakar û pêgir û barhilgirê hevalên xwe bû. Nefs



tenik bû, pesindarî û quretî nediket rex wê mêrxasî û fedakariya wî.

Ji ber vê fedakarî û çalakkariya xwe ya bêpîvan, ji herkesi bêtir rûbiruyê girtin û tehdîdên hêzên ewleyiya dewletê dibû. Li wê derê jî tevî gelek lêdan û îşkenceyan serê xwe neditewand, dilê dijmin xweş nedikir. Baweriya hevalên wî gelek pê dihat. Yên ku hejmara pêşîn a Armancê dîtibin ku li Swêdê dest bi jiyana weşanê kiribû, divê wêneyê binê nig û pahniyekê bê bîra wan ku ji ber îşkenceya polîsan werimî bû, reş û perçe bûbû. Ew bînpê û pahniya Mustafa Tanguner bû ku li qereqolê di encama îşencê de wiha lêhatibû kirin.

Lê Mustafa ne wê rojê û ne piştê, ne di rojên sivik ne jî yên giran de sistî neda bizav û têkoşîna xwe, heta roja hat qetilkirin jî bi wê germiya xwe berdewam kir.

Min û Mustafa tu carî bi hev re di eynî çalakî yan komîteya rêxistinê de kar nekir. Ez zêdetir wek berpîrsê wî yê di hin astên din de bûm. Lê tim ew li derûdoreka ew qas nêzîk bû ku dengê bizavên wî dihatin min.

Piştî darbeya eskerî ya 12-ê Îlona 1980-yê ew jî li gel hin hevalên xwe derket derveyê welêt, berê çû Lubnanê, di kampan de perwerdeya eskerî dît, pişt re ji wê derê li gel hin hevalên xwe ji kontenjana Filistinîyan îmkana perwerdeya xwendina bilind bi dest ket, wî demekê li Bulgaristanê unîversîte xwend. Dema ku sosyalizm li welatên wek Sovyetan û Bulgaristanê têk çû, dewlet jihevket û îmkanên perwerdeyeka birêkûpêk nema, ew derbasî Danîmarkayê bû.

Li wê derê jî ew di sefên herî pêşî yê têkoşîna ji bo rizgarî û azadiya gele Kurd de û li hemberê cuntaya leşkerî a Tirk a 12-ê Îlonê, zilm û zora wê têkoşa. Ew ji roja ku ket nav refên şoreşgeriyê, endamê gencên demokratên şoreşger/DDKD/KîP-ê bû. Di jihev cudabûna piştî 12-ê Îlonê de li ser mesela têkoşîna li hemberî cuntayê wî ciyê xwe li nav Pêşengê stend û heta dawîya jiyana xwe di wan sefan de ma. Ew li dijî perçebûn an cudayiyê bû, lê ne bi buhayê ku dev ji têkoşînê bê berdand. Armançên ji bo azadiyê, wekhevîyê û serbixweyîyê her gav li pêşîya wî bûn. Ew ji malbateka feqîr dihat, bi malbatî wan gelek êş û janên bêderfetiyê dîtibûn. Ew bi rastî jî tam bi doza, bîndest, hejar û bêderfetan ve bestî bû. Durûtî qet li balê tunebû. Fedakarî û xwebexşîneka temamî pêre bû.

Di wan salên piştî 80-yî de, dewleta milîter a faşîst a Tirkiyeyê bizaveka terorîzekirina tevgera şoreşgerî û demokrasîxwazî ya gele Kurd û Tirk a li Ewropayê dabû ber xwe. PKK-ê jî di wan deman de ew terorîzekirina tevgerên kurdî ya li hundurê welêt a salên berî darbeya 1980-yî, derxistibû Ewropayê û li gelek welatan hem hevalên xwe yê ku di nav wan de xwedan ramanên cuda bûn, yan dev ji wan berdidan, hem jî endamên rêxistinên Kurd yê din terorîze dikirin, êrîş dibirin ser wan, ew dikuştin. Mustafa Tanguner jî ji bo ku li Danîmarkayê gelek çalak bû, di encama plangêriyeka PKK-ê ya wiha de ji bal tetikkêşên qatîl yê wê ve, bi bêbextî hat kuştin. Gava ew li mala xwe tenê bû, bi şevê kujeran wek mêvan li deriyê wî da, wî ew wek terefdarên PKK-yî nas dikirin, derî li wan vekir da wan bihewîne, lê bi xayintî û bêbextî ji bal wan ve hat kuştin.

Mustafa Tanguner ji bal emirberên berpîrsên PKK yê di nav kontraya dewleta Tirk hat kuştin, polîsê dewleta Danîmarkayê ku ev welat mittefîkê Tirkiyeyê yê NATO-yê bû qatî girtin, lêkolîneka xemsar li gel wan kir û ew berdand.

Yên ku xwîna wan pênc quruş nedikir, ewladekî mêrxas, fedakar, dilsoz ê gelê Kurd ê gelek hêja kuşt.

Kuştina Mustafa wek şokeka mezin li nav hemî hevalên wî belav bû, xemgîniyeka mezin xist dile wan, çimkî bê îstîsna ew ji bal hemî hevalê xwe yekî pêbawer û hezkirî yê gelek jidil bû. Qimeta wî, li ba hemuyan gelek bilind bû.

Ez bawer dikim yê ku Mustafa nasdikir, heta mirinê kula jidestdana wî ji dile wan dernakeve. Tarîx jê tu carî kujerên wî efû neke, lanete li wan û yê pişt wan.

12.12.2016

Mamoste Nûjen

Şehîdê me

Di malpera Yekbûna Welat da, yekî bi navê Kurdî Diyar* li ser qetlîkirina şehîdê me Mustafa Tanguner nivîsek nivisandiyê. Di vê nivîsê de ê ku min herî pirr êşand ew bû ku Kurdî Diyar yek ji wan kujerên Mustafa Tanguner nas dike û navê wî aşkere nake û li ba xwe vedişêre.



Ya ku paşî de tê gotin ez ê pêşî bêjim.

Ez Kurdî Diyar bi tundî protesto dikim û veşartina vî navê kujer, nelirê û bêehlaqî dibînim.

Ma ev a çi biratiye? Ev çi hevaltî û rêxistinîye?...

Piştî ewqas sal wê nave vî kujerê ji bo çi li ba te veşartî bimîne?

Ka bêje! Çi feydê digihîne malbata Mustafa, heval û hogirên Mustafa, rêxistina Mustafa û hemwelatîyên Mustafa?

Hevalekî te, endamekî rêxistina ku tu tê da berpirsyar bûyi hatiye kuştin û tu nave kujerê wî li ba xwe vedişêrî... gelo çima?

Çima tu kujer deşîfre nakî?

Te vî navê veşartiye bo çi?

Tu deha çi tiştên din vedişêrî?...

Tu çima rastiye nabêji? Wê çi têkeve kîsikê te?...

Ma gelo şehîdê me, Mustafa Tanguner, ji rûyên ên wek te nehat kuştin?

Ma ku te belavoka "Sol birlik" û nizamî çî quzilqurtê nedana Mustafa ji bo belav kirinê û li mala wî nebûnaya mêvan, belkî îro wê Mustafa di nav me da bûna.

Çi bêjim ji te ra? Her tişt li bejna te tê. Lê tika dikim ku tu hew li ser Mustafa Tanguner xeber bidî...

Êdî bes e, hema bila navê kujer li ba te bimîne...

Gotinekî rojavayi ya heye... dibêjin; Ê ku zanibe û nebêje, kujerê herî mezin ew e!...

7.11.2011

**Kurdî Dîyar navekî mahsal e. Wî nivîsa Seîd Aydogmuş ji kurdinfo.com girtîye û çend hevok lê zêde kiriye - ku di beşê tirkî ya vê kitêbê de ev nivîs heye-, di malpera ku Mamoste bahs dike de, beyf ku çavkanî nîşan bide û navê nivîskar bêje, çap kiriye. (notê amadekarê kitêbê).*

Nimet Mumtaz Aydin
**Li dû xweşmêrekî,
dilovanekî millet û welatê xwe**



Sî sal berê me te wenda kir
Him jî bi destê kurdekî ku peyayê
avakarê tarîstanê...

Ji yên wek te ditirsiyan

Bi tunebûna yên wek te ji wan re bergeh fireh dikir

Û sazûmana tirsê şax vedida

Belkî yên li deriyê te xist û tetîk kişand

Qet te nas nedikir, nizanibû tu kî yî?

Nizanibû ew îşkencekarên zîndanên Diyarbekir ji bo te teslim
bigrin

Çi îşkence bi te kirine, elektrîkê dane te, te daleqandine

Di laşê te de çixare tefandine....

Lê nikaribûne serî li te bitewînin!

Hevalo!

Mustafayo, Tevsîro, Naîmo!

Kes te nas neke jî

Ez te baş nas dikim!

Me li Diyarbekir di eynî komîteyê de kar dikir

"Öğrenci Üst Komitesi" -Komîteya Bilind a Xwendevanan-

Ew qapûtî te yê reş û dirêj, dorbenda te ya dirêj û sipî

Hîn wek duh di bîra min de ye

Nuha jî çavê xwe bigrim

Ezê te bi wî şeklî bibînim.

Min her cara tu didît, nikaribûm çavê xwe ji çavên te veqetînim

Min her di ew çavên te yên reş û zeytûnî de kenek biriqandî

digeriyam

Û min her car jî ew ken, ew biriqandin di çavên te de diqefalt

Jixwe ne zehmet bû, çavên te herdem bi ken bû!
Her cara me hev didît te ji hizkirinê, çîmên min bi ew destên
xwe yên giran û stûr duguvaşt
Ji bo qêrîn nekîm min xwe bi zor digirt.

Dû re 12 îlonê hat me hev wenda kir...
Me hevûdin li Pîrhesena Beyrûdê dît
Ma Marîlyasa Saydayê nayê bîra te?
Di bayê hênîkê şevê de, li bin stêrkan, li raserî bajêr û Derya
sipî

Me notirvaniya hevalên xwe dikir.
Ji bo em cesaret bidin hevalê xwe ez û tu wek zarokan tu
dînîtî nema dikir.

Dîsa şevêk weha de te qala evîna xwe ji min re kir.
Dema min navê wê bihîst devê min vekirî û çend deqe wek
heykelek bê hereket mam.
Hevala me ya muşterek derketibû û min tu car guman nekiribû
Li ser navê we her duyan pîrê kêfxweş bûbûm.

Dîsa me hevûdun wenda kir
Ez ji Swêdê re derketim
Te jî xwe li Bulgarîstanê dît
Piştî çend sala tu hatî Danîmarka
Cara dawîn me hev li Kopenhagê dît!
Me di firsenda ewilî de xwe dûrî hevalan kir ku em "nûçeyên
dawîn" di derheqa hev de ji hev re bêjin...
Jixwe di ser re pîrê derbas nebû min xebera reş bihîst

Hevalo! Stêrk ji çavên min nehat xwarê,
Lê dizanim min rûyê xwe li ber asîmanan bilind kir û çavê xwe
girt û lerizîm
Min nepirsî çewa bû,
Min nepirsî kî bûn!

Jixwe îcab nedikir!

Navnîşan diyar bû!

Yên ji fikrê

Yên ji mirovên paqij û durust ditirsiyan

Yên ji demokrasiyê, mirovperweriyê para xwe negirtibûn....

Hevalo!

Ji mêrxasiya te re şahid ne lazim e

Te di zîndanên Diyarbekir

û li her derê jiyane de dilovanî û mêrxasiya xwe nîşan da!

Lê serokê qisasê te û yê emrê kuştina te da ev e 16 sal e
girtiye

Û îro bi milyonan kes ew wek serok dizane

Lê yek carekî wek mêra derneketiye

Negotiye

Ez Kurd im, welatê min Kurdistan e, doza rêwa ya gelê xwe
dikim

Wek roviya çiv dide xwe

Ji bo postê canê xwe amadeye her tiştî bike

Heman demê de bi hezaran xortên bawermend ku di bin emrê
wî de ne bi mêrxasî diçin ser mirinê!

Ev jî qedera reş a milletê me ye

Mustafa!

Xwedê kesî bêhêvî neke!

Me jî Partiya Azadiya Kurdistanê danîye

Tu û yê wek te hêza têkoşinê didin me

Em sond dixun

Heta em sax bin ji bo welat, netew, demokrasi û wekheviyê

têkoşinê bidin! Heta em sax bin emê hesabê te û yê wek te ji

qatilan bipirsin! 4.11.2015

Medeni Marşil Çoban Çeşme

Îro (4.11.2015) 30 saliya şehadeta
hevalê min ê Bismîlî Mustafa
Tanguner e. Di 4.11.1985ê de li
Danîmarkayê ji alfyê "Cuzzam"ê
Apoiyê ve hatibû kuştin. Bi bîr tînim.



Mustefa
Min soz dabû
Wexta bê m Stenbolê
Ezê mezelê te zîyaret bikim
Min soza xwe anî cî
Piştî 34 salan
Di 2ê Tîrmeha 2015ê de ez hatim cem te
Mezelê te nêzî Balafirgeha Ataturk e
Li Yenî Bosnayê
Nêzî "Adli Tip Kurumu" ye
Li baxçeyê Camîya Çoban Çeşme ye
Çoban Çeşme Camîyeka piçûk e
Goristana wê piçûk e û ferah e
Bi tertîp û rêk û pêk e
Mezelê te di nav yê din de berbiçav e.
Lê ser kevirê mezelê te
tarîxa mirina te 24.12.1985
hatîye nivîsandin.
Wer xuya ye ev tarîx, tarîxa spratina te ya axê
ya jî çêkirina roja mezelê te ye.
Hinek heval di 31.01.2014ê de

mezelê te ji nûh ve dan çêkirin
Di bin daran de ye,
Çeşmeyek heye nêzê lingên te
Min ji li wê hinek av da te
Ew 4 salên ku em berîya 30 salan
bi hev re jiyabûn
wek filmek hat ber çavê min
xemgîn bûm, kelogirî bûm.
Min soz dabû ku
ezê qevdeyek gul jî deynim
Lê ez wek swêdiyan fikirîbûm
min got qey li ber goristanê
gulfiroş jî hene
lê ne wisa bû
bira ez deyndarê te bim.

Mustafa

Nizanim ciranê te yê bin erdê
te aciz dikin ya na
ez zanim di nav wan de sebra te jî nayê
ez zanim kes nayên serdana te jî
lê bi qedera xwe razî be
li Kurdistanê êdî
kevirên mezalan jî dişkênin
Nizanim li bin erdê
lê li ser erdê rewş ne baş e
Îsal di meha Îlonê de
erîşê hevvelatîyên te yên li wê kirin
dikanên wan şewitandin,
camê xanîyên wan şikandin,
malên wan talan kirin

ji bo kurdî axafîn
rencîdebûn, hatin kuştin
ewleyîya can û malên wan
di xeterîyê de ye.
lê gel wê jî mixabe
çavên kurdan li metropolan in
Hinek ji mecbûrîyetê lê piranî
bi dilxwazî tên li wê
ne tenê yên welêt,
yên Ewrûpayê jî tên li wê bi cî dibin,
mal û milk dikirin
dev ji li wê bernadin
motinên mezin dikin
lê ji Tirkiyê hes dikin
piştî ku rewş ev be
gazin neke
tu ji bêxwedîtî û ji mecbûrîyetê li wê yî
xwe mahçûp hîs neke
şertên wê demê wilo bû
me tawanbar neke.

Mustafa

Mekanê te navê xwe ji şîrêkî
şairê Tirk Faruk Nafiz ÇAMLIBEL girtîye
Şîra wî ya ÇOBAN ÇEŞMESI.
Di vê şîrê de hin bend hene
parçeyek jîyana te ya
demkurt jî diteysîne
mîsade te hebe
ez vê şîra wî
Ji zimanê orjînal biweşînim.

ÇOBAN ÇEŞMESİ

Derinden derine ırmaklar ağlar,
Uzaktan uzağa çoban çeşmesi,
Ey suyun sesinden anlıyan bağlar,
Ne söyler şu dağa çoban çeşmesi.

"Göynünü Şirin'in aşkı sarınca
Yol almış hayatın ufuklarınca,
O hızla dağları Ferhat yarınca
Başlamış akmağa çoban çeşmesi..."

O zaman başından aşkındı derdi,
Mermeri oyardı, taşı delerdi.
Kaç yanık yolcuya soğuk su verdi.
Değdi kaç dudağa çoban çeşmesi.

Vefasız Aslı'ya yol gösteren bu,
Kerem'in sazına cevap veren bu,
Kuruyan gözlere yaş gönderen bu...
Sızmadı toprağa çoban çeşmesi.

Leyla gelin oldu, Mecnun mezarda,
Bir susuz yolcu yok şimdi dağlarda,
Ateşten kızaran bir gül arar da,
Gezer bağdan bağa çoban çeşmesi,

Ne şair yaş döker, ne aşık ağlar,
Tarihe karıştı eski sevdalar.
Beyhude seslenir, beyhude çağlar,
Bir sola, bir sağa çoban çeşmesi...
Faruk Nafiz ÇAMLIBEL

Nameyên derengmayî -1

Dibê qeyî te sond xwarîye, gava dev ji vê dozê berdî dê sonda te xerab bibe û nikaribî rûyê însanan binêrf. Lê nuha?

Birêz

Naîm Maruf Mohamed

7.11.2005

Tahtalıköy -Turkiye

Merheba Naîm

Ev 20 sal in em bi hev re cejna hev pîroz nakin û ev 20 sal in min ji te re ti nameyekê jî nenivîsand. Tîka ji te, vêya bi tembelîyê ve eleqaya wê tune, û nefikire ku me tu jî bîrkiriye, ya jî nefikire ku li ser me qedexe hatîye danîn em nikarin nameyan binivîsin. Bawer im, ez ne tembel im, ne jî jibîrker. Cama em ji bo te bibîrbînîni me di rojname û kovarên xwe de rismê te çap dikir; mixabin êdî ew kovar û rojname jî rawestîyan û me tu bi bîr nanî. Ji bo vê yekê, ji me nexeyîde, cîye te hergav di kûrayîya dilê me de heye.

Ji ber ku ev demekî dirêj e em nanivîsin me bîrve kiriye çawê name jî dihên nivîsandin. Ji xwe êdî kes ji hev re name jî nanivîsin, kes kesî bi bîr jî nayne, kes naçe hewara hev û alîkarîya hev jî; refleksa piştgirîyê, ruhê hevaltîyê ji mêj ve ye wenda bûye Naîm. Te got wefa? Aman ha! merivan nekenîne. Gotineka weha nemaye. Tenê ew taxekî bajarê Stenbolê ye. Ji xeynî wê ev gotin hemû wateya xwe wenda kiriye.

Tîka, sebebê van hemû tiştan ji min nepirse; nikarim ji bini rabim û bersiva te bidim. Ku bi gotineke bersiva van hemû tiştan bidim, tişteki ku ez di dawîyê de bêjim di destpêkê de bêjim û xwe jê xelas bikim. Dibêjin ya, wexta goşt xerab bibe meriv xweyê lê dike, lê wexta xweyê xerab bibe meriv çi dike?

Mixabin rewşa me jî weha ye Naîm! Nizanim bi te didim fehmkirin.

Rewşa me gişan baş e, piranîya me xanîyên me, vîlayên me, erebeyên me hene û heta ji me hin kes li qiraxa bahra Sipî û Egêyê havîngehên me hene. Em hemû bi kar û barê xwe mijûl in, ji bo taksîden xanî, erebe û havîngeyên xwe bidin pir dixebitin, ji bo wê zêde wextê me namîne. Carna bi mehan heta bi salan em hevûdû nabînin. Ezebên me jî nemane, em hemû zewicîne, bi zarokên xwe re dixwazin bextewar bibin û ji bo duweroja wan dixebitin; ma emê çi bikin! Dinya ne ew dinyaya dema te ye, tu vêya nejiyayî. 20 sal berê ew fedekarî û wefekarîya ku yek ji kerekterê te bû, te niha jî bikira ji sedî sed gelek kes yê bi te henekên xwe bikirana û te exmeq û bêaqil bihesibandana. Eger îro wek te li vir li wir çend kes mabin bawer bike ew jî babetên sohbetan e ya jî garnîtorê sofreyan.

Ez zanim berîya her tiştî tu yî hemşerîyên xwe ji min bipirsî, zimanê min nagere qala wan bikim lê dîsa jî hinek bahsa wan bikim. Ew kesên ku te bi qeleşî kuştin niha bûne kemalîst. Berîya ku ew bibin kemalîst hemşerîye te yî ku te jê hez dikir ew jî piştgirîya wan kir û ew jî ji aliyê kesên qesas dîyar/nedîyar piştî 6 salan hat cem te. Kî zane belkî jî niha hûn bi hev re nin. Belkî haya wî jî nîne van tiştên ji te re dibêjim ji wî re jî bibêje. Kanî ew serokekî wan hebû ya, pir tirsonek derket. Piştî hat girtin got, dîya min tirk e, karşî min nebin, ez amade me xizmeta dewletê bikim. Piştî derxistin mahkemê li wir jî îtiraf kir û got ez karim merivekî 5 pere bimnizanim çi û ci.. Ji xwe însanekî weha xerabe nebûna dê te û yên wek te bi qatîlên xwe bidana kuştin. Ancax însanên tirsonek û eslê xwe înkâr dikin cînayetên weha dikarin, bikin. Niha jî diqîre dê çawa kemalîzmê bi mirîdên xwe bide empezekirin. Van hemû tiştan ji wî Wedatê wek çîya re jî bibêje. Wexta van tiştan bibihîze însallah estîyê wî neêşîn û li

ber nekeve; ev jî wî re nebe ders belkî ji hevjiîna wî re, ji dostên wî re bibe ders û hinêk bifikirin.

Ha min bîrve kir bêjim ji te re Tevsîr, tu zanî niha di legalê de merivê wan yê yekemîn kî ye, bombacîyê me ye; bombecî Osman! Na lo nebêje, bi serê Kurdistanê ew e.

Ez ji te re hinek bahsa wî bikim. Ew jî pir radîkal bû û wek mebûs ket girtîgehê û 10 salan di girtîgehê de ma, piştî derket nerm bû wek ku pişîng şîr birjîne gav paşve avêt. Yanî bombacîyê me bû light. Nekene Tevsîr, valahî wisa ye. Ger ji min bawer nekî, belkî Solci bahsa wî ji te re bike. Ew jî berê çend rojan di sîteya NETKURDê de di derbarê wî de karîkatorekî çêkir û jî re bombacî got. Ji ber ku pir kes meseleyê nizanibûn, fehm nekirin Solcî bahsa kî dike.

Niha tu yî bêjî ev Netkurd çi ye, internet çi ye, ev meseleyeka dûr û dirêj e, heq dernakevim bahsa wê bikim. Bi kurtî jê re dibêjin IT yanî teknolojiya informasiyênê. Netkurd navê malpereke ku ji aliyê hemşeriyên te ve hatiye avakirin û li ser înternetê weşanê dike. Vê babetê ew heval û hemşeriyê te Solcî yê ku tu jê hez dikî belkî wexta wî hebe ji te re bahs bike.

Hemşeriyekê te yê din jî heye ku dema we bi hev re di Dibistana Leylî ya Farqînê de dixwend û hûn bihvre diçûn dibistanê, zarokên Farqînê ji ber hesûdîyan li we dixistin. Ew berê min, te yad kir û di kurdinfo comê de di nivîsa xwe de bibîranî ku me ji bo te wezîfeya xwe neanînîye cî. Carek din dilê min peritî.

Birayê Naîm! Ew birayê me yê sêyem hebû ya, yanî Daniyal hinek bêwefa derket. Ji wî ne hewadîs hene ne jî salix û silav. Dihê bîra te cara ewil em çûn welatê birêz Tojo bi zorê me di balafirê de vexwarin dabû wî da ku heyecanî wî dakeve; ew bi wê dubleyê serxweş bibû. Lê ferq nake, hewadîs jê tunebe jî,

dûrê be jî silavan neşîne jî ew Daniyalê me ye, me bi hev re rojen xweş derbas kir û bîranînên me yên hevpar hene. Ev bîranîn jî nebin ma dê çi qîmeta jiyanê hebe!

Birayê me yê din Sebah ew hin jî li wî welatê ye ku te terqa li wir kiribû, par te bibîranî û ji bo te nameyeka xweş nivîsand. Dibe ku nameya wî hatibe astengkirin û haya te jê tunebe, min xwest ez ji te re bêjim. Wê roja me bi hev re li ser MSNê nivîsand û me tu bibîranî. Me bahsa bîranînekê te kir û em ji kenan mirin. Xwezîya tu jî saxbûna em bi hev re bikenîyana. Tê bîra te wê sala germ a havîna 1982ê em bi hev re li odeyê ders dixebîtin û carna jî dikenîyan. Ew du hevalên me yên odayê yên bûlgar yek ji wan tenê derpê li ser bû, ji kena me aciz bû û bi cîrekê nexweş reaksiyon nîşan da. Te dîsa mêranîya xwe dîyar kir û jê re got cilê xwe li xwe bike em herin derve em qozê xwe bi hev re parve bikin. Lê bi zimanê wan di şûna bêjî cilê xwe li xwe bike, te digot, cilê xwe derxe. Ji xwe lawik derpeyekê tenê li ser bû û te jê re digot wî jî derxe: Lawik şaş mabû, difikirî belkî tu yê tişekî pê bikî. Gava tu ji xeletîya xwe ya zimên hay bûyî, em çawa kenîyabûn, ne wilo?

Nizanîm bahsa rêxistina me bikim ji te re ya na. Belkî bahs nekim çêtir e, dê morala te xerab bibe û estîyê te bihêşin. Ji ber ku ji wê rêxistina mezin zêde eser nemaye. Ji xwe yên te kuştin, îro dixwazin Kurdistanê jî ji xerîtayê derxin. Êdî navê Kurdistanê, serxwebûn, federasyon qala van gotinan nakin. Mixabin ev têgeh bi vî yan jî wî awayê tesîra xwe li ser însanên me jî dîkin. Ew van têgehên hemû xistin ber lingan; demekê tiştên ku Tirk li Çiyayê Agrîyê beton kirin, ew dixwazin îro li Amedê bikin. Rewş hinek wahîm e, nîrx û norm tevlihev bûne! Carna di dilê xwe de dibêjim baş e tu tuneyî û van tiştan nabînî, tu yî ji qahra herroj bîmîyayî.

Îro çiqas ihtîyacîya me însanên wek te pak, paqij, wêrek cefekar, wefekar û fedekar hene. Bi vê hestîyarên xwe di 20

salîya şahdetê te de te bi rehmet û hesret bi bîr tînim; û qetîlan
jî hewaleyê dîrokê dikim.

Ha bîr ve kîrim ji te re bêjim, hemşeriyê te yî Hambûrgê Cafer
heye ya ew jî hewildide ku DDKDyîyan bîne berhev. Tu yî niha
bêjî ma kes nema Cafer vî karî hilandîye ser milê xwe. Mixabin
wisa ye Naîm!

Berî ez dawî bi nameya xwe bînim, ji te re xeberên min yên
xweş jî hene. Ji mezel rabî- gerçi ciyê mezelê te jî ne dîyar e-
tu yî bi çavên xwe bawer nekî. Ka me digot ya; "Barzani kî vî
navî nizane" ew niha bûne dewlet. Bûne xwediyê her tiştî;
alaya wan heye, parlamentoya wan heye, hukimeta wan,
serokwezîr û wezîrê wan unîversîyên wan yanî çi bihêjî ew
wan bidestxistine. Çend roj berê serokê wan Mesûd Barzanî li
Koşka Sipî ya DYA yê pêşwşewazî lê kirin û ji wî re gotin
serokê Kurdistanê. Nebêje, bawer nakim, bi serê te wisa ye.
Yanî serokê DYA Bush em ji Seddam xelas kir. Belkî te
Seddam jî ji bîr kiriye, lê bawer nakim. Ji ber ku di dema salên
telebetîya me de xwendekarên wî hebûn ya, ew xwendekarên
ku bi dolarên petrola me alîşverîş dikirin û bi erebeyên xwe
yên xweş caka difrotin. Ha min bîr ve kir bêjim; mam Celalê
me jî bûye serokkomarê Iraqê. Him jî berê mehekî li NY li ber
serok û serokwezîrên hemû dinyayê bi kurdî jî axaft. Tu rihet
razê, karê kurdan baş diçe.
Bi hesret himbêz dikim.

Birayê te

Helîm

Adres

Helîm Maruf Mohamed

c/o Sebah Xasuwani Mohamed

Blok 18, room 1024

Tahtakurusu-Bulgarien

Nameyên derengmayî - 2

Dibê qeyî te sond xwarîye, gava dev ji vê dozê berdî dê sonda te xerab bibe û nikaribî rûyê însanan binêrf. Lê nuha?

Birêz

28.12.2005

Naîm Maruf Mohamed

Tahtalıköy

Turkiye

Merheba Naîm

Tam ev bû 20 sal me bi hev re serê sale pîroz nekir, em bi hev re serxweş nebûn, hêvî û daxwazên nû yê sale negot. Gelo sebebê vê yekê bêwefayî, neçêyî û kesên bêbêxt in?

Ser sala herî dawî me çawa pîroz kiribû, hinek dihê bîra min. Me bi nivê pereyên bêrika xwe şereb, moskovskaya û konyak kiribû, yên mayî jî pê mirîşk, kartol, sebzê û fêkî kiribû. Ji xwe jî mehê sê-çar caran me patat û mirîşk dixwar; em hînê wê bibûn û serê salê jî bê wan nedibû. Me çend hevalên kurdên binxetê jî ezimandibû û bi hev re heta serê sibê kêf kiribû û bi peyamên baş ketibûn sala nû. Lê ji bêperetiyê me hemû meha yekê li vir û li wir derbas kiribû. Çavfirehî û destvekiriyê em bêpere hiştibû.

Di nameya yekem de navnîşana te ne dihat zanîn ji bo wê min Tehtalikoy nivîsandibû. Vê bi zanetî lê bi dilekî bi xwîn û xemgîn nivîsandibû. Lê ev gotineka nehezimbar bû. Di şûna te de karibû ez ya jî yekî din bûna. Tenê min bi vêya bêwefayîya me anî zimên. Ji bo vêya min çend rexne girt lê bi bersiva min, bawer im ew îqna bûn. Ji aliyê din hinek heval meraq kirine ka ev kî weha raste rast dinivisîne û rastiyê me derdixîne ber çavan. Ferq nake millet çawa tê digihê bila bigihê, piştî ku di

nivîsê de heqaret tunebe û li gor norman be, yê din tefarûat in. Lê weha hîs dikim ku bi tevayî yê name xwendine jê zewq wergirtine; hejmara wan gelek in.

Bîrayê min!

Ez hin venegerîyame welêt. Wexta ez vegerim karê min yê yekem ezê rêya xwe li Mudurîyeta Goristana Bêxwedî ya Şarederîya Stenbolê bixim û cîyê mezelê te ji wan bipirsim. Ez ê ji wan re bêjim; hevalê min Mustafa di 4ê Mijdara 1985ê de hin 26 salî bû li Danîmarkayê bi qeleşî hat kuştin û cenazeyê wî ji bêxwedîtîyê negihaştîye destê heskirîyên wî û li vir wenda bûye. Ji ber ku wê demê demeka bitirs û xof bû kes xwedî li cenazeyê wî derneketîye û kes ji bavê wî yê feqîr û seqet re jî negotîye ku kurê wî hatiye kuştin û kes ji qezaya Bismilê ya Diyarbekirê nehatiye Stenbolê û pêşewazî li cenazê wî nekirine û meytê wî bi ihtîmaleka mezin li Stenbolê li goristana bêxwedî hatiye veşartin; û ez wek hevalê wî yê ku piştî 20 salan li mezelê wî digirim. Wexta mezelê te bibînim ezê wê bidim çêkirin û mecal hebe li ser kevirê mezelê te; *Dibê qeyf te sond xwarîye, gava dev ji vê dozê berdî dê sonda te xerab bibe û nikaribî rûyê însanan binêrî. Lê nuha?* Binivîsnim û destegulekê deynim ser mezelê te û bi nivco be jî di hundirêxwe de fatîhayekê bixwînim.

Ger tu min bipirsî îdare ye. Carna wexta dibêjim normal e ya jî îdare ye, hinek heval, nas û dost di bin simbil de dikenin. Tu yê çî bêjî. Ji xwe tu dizanî piştî gelek badîreyan me bi hev re sînore mayinkirî bi dizî derbas kir û terka welêt kir. Yanî hin nebibûm 25 salî, şîmaqa micadeleya sîyasî xwar, şkenca dît, hepis raketim, nexweş ketim, organên min ji sêya yekê wê bi ariza ne, wek di taştê de zeytinan bixwîm, heb davêjim û heta niha rojekê tuneye ku derman bi kar neynim. Û di van 20 salên dawîyê de jî çend nexweşîyên din jî zêde bûn; meriv çawa dikare bêje ez baş im!

Û gava rewşa wan tirşikçi û rantçî yên kurd dihên ber çavên min, tiştên ku dinivsinin û tiştê ku dikin dibînim û emrê wan 50 û li ser 50 ye û ew hin rotaya xwe rast nekirine û zîqzaq dikin ferq dikim, dê meriv çawa bêşe baş im, bona wê dibêjim normal e.

Neysel min di nameya din de dê bahsa hemşerîyekê te yê din jî bikira; min bîrve kir. Bibûre! Belkî ne tam hemşerîyê te ye ji bona vê yekê min bahsa wî, ji te re nekir. Tê bira te Naîm li Beyrûdê Şibilek hebû yê herî piçûkê me. Di wê dema krîza partîya me de rojek Şibil hemşerîyê te tehdît kiriye, hemşerîyê te giliyê wî ji îdareciyan re kiriye; yên li wê gelek kenîyane. Ev bûyar, Nûriyî Gercûsî anî bîra min Naîm. Tê bîra te ew jî bejin kin bû û solên ku panîya wan bilind bûn, dikir lingên xwe. Ew gava li Bûrsayê Ensutiya Perwerdeyê de xwendekar e, rojek di nav hevalên me û rêxistina Dev-Yolê de mînaqêşe û pevçûn çêdibe. Nûriyê me jî li baxçeyê enstitûyê li ser bankê rûniştîye, yekî Dev-Yolciyê bejin dirêj û qerase gotinên nebaş ji DDKDYîyan re dibêje; Nûriyê me midaxale kiriye û jê re gotîye, wilo gotinên nebaş neke, ez rabim ser lingan ezê te bikim bin lingê xwe ha pîs herif, ew Dev-Yolciyê qerase nizanibûye çi bibêje, pişt ustîyê xwe xurandîye û ji li wê dûr ketîye. Mesela Şibil jî tiştêkî wilo bû.

Qasî ez zanim navçeya ku tu ji wê yî navçeyeka maciran e, ew jî belkî macir be. Belkî jî eslê wî ne kurd e. Lê kurd be dê çi bibe. Di dema xwe de min ji hin kesan bihîstibû ku ew kurdan piçûk dibîne û li gel wê jî li ser navê wan proje çêdike û pere qezenc dike.

Ji xwe îro, yên rojane kurdayetîyê nayijin û kurdayetîya wan gelek qels in, berpîrsîyarîya kurdperwerîyê dikin. Û ji van kurdan hin kes yên ku xwe jîr dihesibînin li ser navê kurdan projeyan çêdikin, lê ew van projeyan heram û genî dikin û bi

vê hawayî doza pîroz a kurdan dejenere dikin û dixin ber
lingan.

Mixabin Mistafa, îro yên ji kurdan re heqaret dikin jî eferîm
vedigirin, kes guh nade heqaretan ango xelk îşê xwe zane.
Çunkî ew li dû bidestxisina rantê ne, kurd û welatperwerî
mortalê vî karî ne. Yanî ciyê weletperwerî perewergerî girtîye
û ji bo wê jî kurd bisemakevin. Bi dehan dest dikeve nav
tevgera kurdî û di serê wan de bi sedan rovî digerin.

Dîsa min babatê belav kir. Xwedêgiravî min bahsa hemşeriyê
te dikir. Kanî dihê bîra te, te navekî li wî kiribû, nizam çiyê
Bismîlê... Ew meriv... Mêrik got ezê bi projeyan dezgeheka
dafmî ya Kurdî ava bikim, lê xîle ser xîle kir, dev ji yên zindî
berde, Însanên mirî jî xist binê tohmetê, qaşo hemşeriyê te. Ji
dezgehên dewlatê bigre heta kurdên piştî çiyayên Qafê
hemûyan bi kar anîye û xapandîye. Rojname di derbarê wî de
nivîsandin, di derheqî wî de gîlî hat kirin, mahkeme vebûn û
heta hevalên wî li rûyê wî nenêrîn. Lê qet xema wî nîne. Ku
hin dewsa wî de bûna ne wî bajarî dê terka wî welatî bikirana.

Dihê bîra te Naîm, di rojek sar û seqem û cemed de destên
me di berikên me de em diçûn rawestgeha otobusê da herin
zanîngehê lê em herdû şemitîbûn û li ser qûnê erdê ketibûn.
Bêhemdî li wê avayîyekê ku jinekek di pencereyê de çarşeba
xwe dadiweşand bi ketina me kenî bû. Piştê wê ketinê ji bo
şermê em di wê rêyê de bi mehan neçûn û nehatin û me rêya
xwe dirêj dikir û diçûn rawestgeha otobusê.

Halê Însanîyetiyê ye Mistefa, tu yî çî bibêjî, hin kes ji ber
xwezayîya xwezayê tiştên ku tîr serê wan jê şerm dikin, hinek
jî li ser navê kurdan suîstîmalî dikin, ji hevalê xwe rû nabînin û
di derheqê wan de kes tiştên nebaş dibêjin, qet xama wan
nîne. Ji bo Xwedê dê halê Însanên me çî bibe.

Min di nameya yekem de nivîsandibû ku hinek hewildan hene ku DDKDyî bîn ber hev. Ji wê gelenegê însan gelek germ li vê meseleyê dinêrin, lê li gor bawerîya min zahmetiyên wê jî hene. Berê her tiştî ev cimaet xwe xwende û zane dihesibîne lê cimaetên weha di civatê de nexweşiyên wan yên taybet hene. Ji alî din, di vê cimaetê de kesê ku gotîna wî muteber be tuneye; hejmara kesên samîmî, biryardar durist jî ne zêde ne û divê vêya jî bêjim hinek jihevxeşiyên û nayên ber hev.

Dinya pir hatiye guherandin Naîm. Normal e ku دنیا bêguherandin lê însan ji bo menfeatên xwe yên bencil divê evqas nehên guhartin. Pir ditirsim Mustafa. Xwedê neke sibê yek rabe ji bo menfeatê xwe yê şexsî bêje, wî jî Apoyîyan rexne dikir û mirinê heq kiribû binivîsîne, ez ê qet şaş nebim; ji ber ku siyaseta gelek gemarî bûye û însanên me jî gemar bûne.

Bi daxwaza sala 2005ê ji bo te û hevalên wek te bibe sala bibîranînê û hurmetê; sala nû ya hemû hevalan ji dil û can pîroz dikim

Birayê te
Helîm

Adres
Helîm Maruf Mohamed
c/o Sebah Xasuwani Mohamed
Blok 18, room 1024
Tahtakurusu-Bulgarien

Nameyên derengmayî -3

Dibê qeyî te sond xwariye, gava dev ji vê dozê berdî dê sonda te xerab bibe û nikaribî rûyê însanan binêrî. Lê nuha?

Birêz

19.03.2006

Naîm Maruf Mohamed

Tahtalıköy Turkiye

Merhaba Naîm

Me ji 20 salan zêdetir e bi hev re Newroz pîroz nekir, bi hev re kêf û şahî nekir. Yê n ku bûne sebaba vê yekê xwedê ji wan re nehêle, mala wan xerab bibe. Lê dîsa jî nifir ne xweş in. Yê n ku kesên wek te kuştin niha jî bi awayekî rezîl kesên ku ji wan vediqetin û mihalefet dikin yek bi yek dikujin. Rewşa wan ya berbiçav dişibe rewşa wê rêxistina UNITA ku qaşo şerê neteweyî Angolayê dikir ku me di xortaniya xwe de xwendibû.

Naîm, Newroza te û Newroza wan kesen ber te pîroz dikim. Di vê nameyê de ezê ji te re bahsa çîroka pîrozbayîya Newrozekê bikim. Piştî ku tu ji me veqetiyayî em kurdên li wir me bi hev re pîrozbayîya Newrozê kir, ev Newroza yekem a kitlewî bû. Di salên ku di navbera rêxistinên de reqabet li sertarê bû û yek yekê din qebûl nedikir em rêxistinên çar perçayan hatibûn ber hev û bi navê Hevkarî rêxistineka ava kiribû û çalakîya wê yê yekem pîrozkirina Newrozê bû. Lê me amadekarîya newrozê bi dîzî dikir ji ber ku em dizanibûn ku dewletên ku Kurdistan di bin nîrê wan de bûn û têkilîya wan bi Bûlgaristanê re baş bûn dê midexaleyê pîrozkirinina Newrozê bikirina. Ev dewlet Iraqa Seddam bû ku tedaxulê Newrozê ku

bi hezar kilometer dûrê wan bû, dikir. Ji ber wê jî me ciyê Newrozê bidizî digirt.

Di nav komîteyê de me du kurdên bakur cîyê pîrozklîrîna Newrozê organîzekirbû û xeynî me heta endamên komîteyê jî cîyê wê nizanibûn û me biryar girtibû berîya du saetan destpêka Newrozê me yê cîyê wê ji endamên din yên komîteyê û xwendekaran re bigota. Wê gavê em hemû xwendekarên Kurd li Tehtakurusu diman û di nav 20 deqîqeyan de me karibûn em hev bibin û ji bo wê jî mişkule tunebû.

Bi gelemperî rojên yekşemê ji bo min rojen gelek nexweş in, lê her çi hîkmet bû ev yekşem hinek guhartî bû; belkî jî cara yekem me yê bi hev re bi girseyî di restoranteka mezin de Newrozê pîroz bikira belkî ji heyecan wê bû, ev yekşem hinek cida bû.

Heta saeta Newrozê her tişt li gor dilê me derbas bibû. Du saet ji Newrozê re ma, me cîyê wê ji xelkê re got. Ciyê wê 10 deqîqe dûr bû û heroj em di ber de bi otopûsê derbas dibûn û qet nediket bîra yekê ku emê restorantekî weha li gor şertên li wê liks û mezin peyda bikin û ji bo wê jî herkes cîyê Newrozê ecibandibû.

Gava em wek komîte çûn restorantê û me bihîst ku ji sefaretî Iraqê du kermend di odeyêkê de rûniştine, em matmayî mabûn. Seyr bû ku di rojek tatîlê de û di nav du saetan de karmend çawa pê hesiyabûn ku emê li wê Newrozê pîroz bikin. Wan ji me re got, hûn nikarin Newrozê pîroz bikin, emê midaxeleyê wê bikin û hûnê di encamê de zirar bibînin. Di komîteyê de kurdên başûr jî hebûn û bi wan re bi erebî diaxîfîn; yek ji wan got kurdên bakur Newrozê organîzekirine û ew jî wek mêvan hatine Newrozê. Em wek kurdên bakur bi wan re ketibûn mînaqeseyê û bi zanetî me mînaqeseyê dirêj dikir û di vê navbeynê de edî xelk û dostên ku me wan dawetê

Newrozê kiribû hatibûn restorantê. Ew jî nêhirên restorant tije bûye û fehm kirin ku ew êdî nikarin pîrzobayîyê asteng bikin, piştâ stûyê xwe xurandin û derketin çûn lê tehdîta xwe jî kirin û gotin hûnê bibînin. Dîpolamatên welatên rojhilata navîn di eslê xwe de ew ne dîplomat in, qatîl in. Ma serokên Kurdên Îranê Qasimlo û Şerefkendî bi destê van qaşo diplomatên nehatin kuştin?

Naîm, nizamim dihê bîra te di sinifa me de jinêka bi navê Suham endama Partîya Komunîst a Iraqê hebû, mêrê wê Baasî bû û keçikeka wan ya sempatîk a 6-7 salî hebû. Ew çiqas dildarê doza xwe bû û me ekredan jî dost didît û doza kurdî ji dil diparast. Me jî pê re henekan dikir û me jê re digot ; mademkî tu evqas bi doza xwe bawerî tu çima bi hevreyêkî xwe re nezewicî û bi vî zîlamê Baasî re zewicîyî. Ew jî dikenîya û digot; welahî bilahî ew ne Baasî ye, Baasî be jî Baasîyekî baş e. Ew jî hatibû Newrozê.

Naîm zanî ew Baasîyê baş çî anî serê Suhama dosta kurd a komunîst. Ew Baasî yê Seddam rojek di malê de di kuveytê de Suham bi bivir peram perçe kiriye û keça xwe girtîye û revîyaye Baxdayê. Wextekê birêz Bush Seddam ji Kuweytê derxistibû lê Suhamê ji destê wî Baasîstê dest bixwîn kes ji kuveytê xelas nekiribû. Kî zane piştî aqûbeta Seddam ku mêrê wê sax mabe belkî niha ax û wax dike, û keça wî jî miheqeq fêr bûye ku çî hatiya serî dîya wê, ew jî ji bavê xwe nefret dike. Ev bûyarekê ye em bûne şahidê wê, ma ev Saddamê qesebê Rojhilata Navîn çî neaniye serê mixaletetên xwe, mirîdên xwe çawa ji însanîyetîyê derxistîye; qatîlên ku jinekî, dayîkekê, hevjinêkî bêyî çavê xwe bişkinê ji ortî rake, afirandiye.

Tiştên ku heta niha hatine nivisandin, belavkirin û bihîstin nîşan dide ku zatê li Îmralityê jî dişibe wî. Tenê ferqekê wan heye yek di îktidarê de ye weha dike yê din di mixalefetê de dixwaze wek wî bike. Qesebê Baxdayê niha li ber dadgehê ji

alîyê dozger û dadgerên Silêmanî û Helepçeyî dihê darizandin
û li benda tawana xwe ye; ku edalet tecelî bike; belkî
dîktatorên din yên Rojilata Navîn jê ders werbigrin. Lê naflî e.
Wayê serokê Îranê yê nû Ahmedînejad gefê xwe li dinyayê
dike.

Yanî me di destpêkê de ciyê Newrozê annons bikira me yê
nikaribûna Newrozê pîroz bikira; dê sefereta Iraqê biketana
dewrê, petrola me ya ku di bin destê Saddam de ye dê li dijî
Bay Tojo wek şantaj bi kar banîya; Bay Tojo jî ji bo cî daye me
dê şefê restorêntê ji kar bavêta û xwendekarên ku di komîteyê
de cî stendibûn dê ji dibistanê dûr bixistana. Wê demê dinya
du qutûb bû û şerê sar di navbêna wan de hebû. Welatên
sosyalîst rejimên Baasê yên Iraqê û Sûriyê anti-emperyalîst
didîtin û partiyên komunîstê van welatan ku wek partiyên bîra
dihesibandin ew jî formel bi partiyên Baasê re di îktîdarê de
hevpar bûn û ev siyaset li gor welatên sosyalîst bû.

Di vê pîrozkirina Newrozê de me fehm kir di nav kurdan de
merivên Saddam hene û ji xwe wextê Saddam ji îktîdarê ket,
derket ortê ku hin rêvebirên partiyên Kurdên başûr bi wî re kar
kîrine. Wek xuyaye tiştên weha li wir normal dihê dîtin. Divê ez
dîyar bikim li welatê bay Tojo serokê partiyekê kurdên binxetê
li kêleka sefareta Iraqê xanîyek kirê kiribû. Naîm zanî wexta
navê wî merivê dibihîsim her çi seyr e gotina serokê nemir
Barzanî ya di derheqê casûsîyê de dihê bîra min. Rojek
hevalên wî ji Barzanî re dibêjin filankes casûs e, Barzanî
dibêje; ez zanim ew casûs e, lê ez nizanim segbav casûsî
kîjan welatî ye. Tam ev zilam jî wek gotina Barzanî ye, meriv
nizane yê kîjan welatî ye lê mêrik beynelmînel e û hergav li ser
kar e. Niha jî li ser axa azad bi navê KAWA komeleyekê kulturî
avakiriye, ji alîyê din ve jî bazirganîyê dike; li gor dihê bihîstin
bazirganîyê jî bi serokwezîrê Hukimeta Herêma Kurdistanê re
